

MÎTOLOJÎ Û TESEWÎF: ÇEMŞÎD Û CAMÊ CEM DÎ DÎWANA MELAYÊ CİZÎRÎ DE

Shahab VALİ

Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Turkiye,
vali.shahab@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0003-0580-1598>

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 17/09/2024, Accepted / Kabul Tarihi: 19/05/2025
Doi: <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1551814>

Ev gotar îlhama xwe ji pêşkêşîya Shahab Vali ya bi navê "Dî Dîwana Melayê Cizîrî de Bikaranîna Mîtolojîyê: Mînaka Çemşîd û Camê Cem" digire ku di Sempozyûma Kurdîyatê IV, Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî, 25-26ê Gulanê 2023 (Zanîngeha Wan Yüzüncüyîlê) de hatibû pêşkêşkirin.

Mîtolojî û Tesewîf: Çemşîd û Camê Cem di Dîwana Melayê Cizîrî de

Kurte

Her wekî têkilîya xurt a edebîyatê û mîtolojîyê, têkilîyeke xurt a hêmanên mîtolojîk û bikaranîna wan a di metnên edebî de heye. Bi vî rengî, di zortirê metnên edebîyata cîhanî û yên edebîyata kurdî de, nemaze yên klasîk de hêmanên mîtolojîk bi gelek wate û temsîlan hatine bikaranîn û hêz û şiyaneke xurt dane hunerkariya metnê. Hinek ji wan hêmanan zêdetir wekî temsîlên edebî dimînin û hinek ji wan ji kirasê xwe yên edebî wêdetir, wateyên kûrtir li xwe dikin, dibin temsîlên hizrî-îrfanî-tesewîfî. Wekî padişahê efsanewî Çemşîd û wekî amûreke cîhanbîn Camê Cem miqabîlî vê temsîlê dikin û di berhemên edebî yên cûrbicûr de cihêkî berfireh digirin.

Herwekî şairên mutesewîf ên Faris ên wekî Senayî, ‘Ettar, Mewlana û Hafîz, şairên kurd ên wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Nalî û gelek kesên din di wate û temsîlên cuda de behsa Çemşîd û Camê Cem kirine. Dîwana Melayê Cizîrî ku yek şakarên edebîyata kurdî ye, ji layê hewandina hêmanên edebî-mîtîk û tesewîfî ve yek ji berhemên herî dewlemend e û Çemşîd û Camê Cem ji di vê berhemê de cihên xwe girtine.

Em ê di vê gotara xwe de berê xwe bidin helbestên Melayê Cizîrî û lê binêrên ka wî di çarçoveyê çawa ya edebî-tesewîfî de ev her du hêman bi kar anîne. Berîya wê em ê hem li ser wateyên kûr ên Çemşîd û Camê Cemê, hem jî li ser cihê wan ê di nêrîna tesewîfî de bisekinin û layênên van her du temsîlan vebeyan bikin.

Peyvên Sereke: Melayê Cizîrî, Mîtolojî, Tesewîf, Çemşîd, Camê Cem.

Mythology and Mysticism: Jamshid and Jâm-i Jam in Mullah Jezer's Dîvan

Abstract

As is known, there is a very fundamental relationship between mythology, mythical elements and literature and their use in many literary texts of world literature. In this way, in Kurdish literature, as in all world literature, especially the classical ones, mythical personalities, figures and elements have been used with many representations and meanings and have given a skill to the art of the text. Some of those personalities, figures and elements remain more like literary representations and some of them take on deeper meanings beyond their literary guise, becoming philosophical-gnostic-mystical representations. As a mythical king, Jamshid and Cup of Jamshid (Jâm-i Jam) as a tool for the future are against this representation and occupy a wide place in various literary works. Like many poets of Persian literature such as Senai, Attar, Rumi and Hafiz, Kurdish poets such as Ahmad Khani, Mullah Jezeri, Nali and many others have mentioned Jamshid and his Cup in different meanings and representations. The Divan of Mullah Jezeri, which is one of the masterpieces of Kurdish literature, is one of the richest works in terms of combining literary-mythical and mystical elements, and Jamshid and his famous Cup have also taken their place in this work. The main aim of this study is to try to analyse the poems of Mullah Jezeri and see how he used these two figure/element in a literary-fictional-mystical context. So, first of all, we will focus on both the history of Jamshid and his Cup, as well as their place in the Islamic mystic view and explain the layers of these representations.

Keywords: Mullah Jezeri, Mythology, Mysticism, Jamshid, Jâm-i Jam.

DESTPÊK

Girîngîya mîtos û rîwayetên mîtîk û bikaranîna wan a ji aliyê şair û nivîskarên ve di berhemên edebî de, bi xebatên li ser tarîxa edebîyatê bi berfirehî hatîye nîqaşkirin û îspatkirin. Heke em bibêjin ku tarîxa edebîyata cîhanê bi temamî li jêr bandora mîtos û mîtolojîyê maye û li ser wan ava bûye, dê nebe mibalexe (Vali, 2022, 41-43). Peywendîya bîngêhîn û kûr a mîtosê ya ligel vegotin û çîrokê bûye sebeb ku hejmareke zêde ji pisporên qadê, mîtosê wekî çîrokekê pênase bikin. Ev hîpotezeke zanistî ye û îdîa dike ku forma vegotinê (Segal, 2004a, 29) an ravekirina sedemî/egerî ya bûyeran a bi şîklê çîrokekê ye (Segal, 2004b, 84). Mîtos wekî çîrokeke sembolîk ku ji bo civakekê yan komeke civakî pir balkêş e, wekî nimûne an ji wê cuda wekî modeleke ayînî yan jî şiroveya “hebûn”ê pêşkêş dike (Chardin, 1989: 164).

Ji ber ku mîtos “vedibêje”, tomar û rave dike (Horkheimer & Adorno, 2002, 5) û edebîyat jî qeyd û tomarkirina spekulasyona (ramana teorîk) herî bilind û berfireh a însan e (Einstein, 1968, 369). Mîtos, edebîyatek e ku afirandina estetîka xeyalên mirovî, di forma çîrok, vegotin an helbestekê de hesab dike û dihevwîne (Chase, 1960, 129). Ji ber vê jî rîwayetên mîtîk dikarin wekî xala destpêkê ji bo edebîyat û cureyên wê bîn hesibandin.

Di edebîyata kurdî de jî pêwendîya mîtosê ligel berhemên edebî yên kurdî û bikaranîna bûyer, kesayet an hêmanên mîtîk, berbiçav e. Zîra mîtos di nav xeyalê de zindî dibin û “xeyal jî çavkanîya bîngêhîn a şair e ji bo afirandina helbestê. Yanî mîtos “çêbûn e” da ku xeyal, wan zindî bike (Camus, 2010, 117). Di warê vegotinê de mîtos, teqlîdkirina nêzik an di nav aksiyonê de ye li ser sînorên xeyalî yên daxwazê (Frye, 1973, 136). Yanî peywendîya helbest û helbestvanî/ê ya ligel mîtosê peywendîyeke taybet e û şair hertim ji mîtosê deyn digirin. Ji ber ku mîtos destpêk û dawîya edebîyatê ye û yên ku mîtosê zindî dikin, ji dîroknasan zêdetir, helbestvan in (Monneyron, 2012, 55) û mîtosên li ber destê me, ji aliyê helbestvanên mezin ve hatine afirandin (Falck, 1991, 118). Li gor Tolkien divê mîtos ji aliyê helbestvanekî bê pêşkêşkirin ku wê bêhtir hîs dike û di cîhana tarîx û coxrafayê de enkarne dike, zîra girîngîya mîtosê li ser kaxeze bi rêya aqilê analîtîk nikare bê pêvekirin (Tolkien, 1936, 6).

Piştî belavbûna dîne îslamê di coxrafyaya Îranê de, têgeh û bîr û bawerîyên mîtolojîk/dînî ku di bîrên kolektîf ên çandî yên xelkê de xwedî cih bûn, hebûna xwe domandine û di bin cîl û bergên nû de, di çarçoveya sembolan/bawerîyan de, di gelek warên çanda îranî de ji nû ve derketine holê. Qada herî girîng a vejîn û jinûvederketina çanda kevn jî bêguman edebîyat û helbest bû. Mîtosên kevn jî bi rêya edebîyatê, bi taybet di qalibê helbestê de, hebûna xwe heta îro berdewam kirine. Zîra mîtos wekî bîngêha helbestê ye û tê îdîakirin ku bîyê mîtosên ku hatine veguhestin, tişteki ku bi awayekî helbestkî bê veguhestin, tunebû (Ricoeur, 1983, 79).

Lêkolînên li ser tarîxa edebîyata kurdî nîşan didin ku, wekî edebîyata neteweyên din, cih û rola rîwayetên mîtolojîk di hemû cure û zaravayên kurdî de, xwedî cih û rolekî taybet û bîngêhîn e. Digel ku sehaya herî girîng ku çîrok û rîwayetên mîtîk tê de tomar bûne û gihiştine roja me, edebîyata destanî ye, lê dikare bê dîtîn ku hebûn û bikaranîna rîwayet, kesayet/leheng û hêmanên mîtolojîk di metnên edebî yên kurdî de hebûnek mutleq û “li her derê” (omnipresent) ye û tenê bi rîwayet û metnên kevn ên destanî sînordar nîne û di edebîyata gelêrî, klasîk û nûjen a kurdî de dubare dibe. Nêrînek giştî li ser edebîyata kurdî ya gelêrî, klasîk û nûjen, bi zaravayên cuda, cihê taybet ê rîwayetên mîtîk êşkere dike.

Dikare bê gotin ku yek ji çavkanîyên edebîyata kurdî ya klasîk belkî yek ji para herî mezin, mîtolojî ye û ev edebîyat ji kanîya mîtolojîyê têra xwe sûd û bandor wergirtiye (Aykaç, 2022, 205). Wekî hat gotin, di edebîyata kurdî ya klasîk de ku wekî “edebîyata kurdî ya nivîskî ya di serdema îslamî de di bin bandora dîne Îslamê, unsurên erebî û farisî û çanda Îranê de li gorî hinek rêzîkan hatîye meydanê (Adak, 2013, 27) tê pênasekirin, rîwayetên mîtîk wekî çavkanîyeke îlhamê ji aliyê şairên kurd ve tîr bikaranîn. Di helbesta klasîk a şairên navdar ên kurd wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Nalî, Xanayê Qubadî, Kurdî, Fethî, Şêx Riza Talebanî, Nûrî û hwd. gelek caran navê padişah/leheng/hemanên mîtolojîk wekî arketîp an pêşnimûne hatîye bikaranîn.

Di edebîyata kurdî ya klasîk de arketîpên mîtolojîk dikarin di çarçoveya kesayetên kurdî/îranî û yên “biyanî/dijmin” ve bîn senifandin. Arketîpên kurd/îranî jî di nav xwe de sê kategorîyên cuda ne: Padişah, leheng û hebûnên sersirûştî. Padişahên herî navdar ku di metnên klasîk û helbestên şairên kurd de hatine zikirkirin Cemşîd, Fereydûn, Key Qubad, Key Kawûs û Key Xusrew in.

Lê dikare bê gotin ku di helbesta kurdî ya klasîk de padişahê mîtolojîk ê herî navdar ku wekî arketîpa îhtîşamê hatiye bikaranîn padişahê mîtolojîk Cemşîd e. Di edebîyata kurdî ya klasîk de Cemşîd wekî arketîpa hêz, qudret û desthilatdarî, car caran di asta Suleyman Pêxember û xwedî mulk û xatema wî û car caran jî bi Îskenderê Mezin re jî hatiye bibîranîn. Nîşaneyê herî nasrê a kesayeta wî di helbesta kurdî ya klasîk de jî bêguman Camê Cem e ku navê wî bi cama wî re êdî bûye yek (Aykaç, 2022, 208-209).

1. Di Metnên Berîya Îslamî de Cemşîd û Camê Cem

Di mîtolojiya kurdo-îranî de yek ji padişahên herî navdar Cemşîd e. Cemşîd ne tenê yek ji lehengên mîtolojîk û neteweyî yê Îranê ye, di heman demê de di nav gelên hindu-îranî de jî xuya dibe (Azarnouche & Redard, 2012). Navê Cemşîd jî du peyvên pêk tê: Cem bi avestayî “Yima”, bi pehlewî “Yam”, û “Şîd” bi avestayî “Xšaeta” û bi pehlewî “Şêt”. Ji bo vî navî du wate jî alîyê zimannasan ve tên pêşnîyazkirin: Cemê ronî an Cemê padişah (Restgar Fesayî, 1383, 311).

Çavkanîya herî kevn ku behsa Cemşîd tê de hatiye kirin, Avesta ye. Di Avestayê de, çend mîtos bi Yima/Cem ve girêdayî ne. Li gorî rîwayeta Avestayê Cemê horçîhrê xweşkirî, kurê Wiyewngehan, yekem kes bû ku berîya Zerdeşt Ehûremezda dixwest bibe dîndar û dînzane Ehûremezda (pêxember) di cihanê de û yekem kes bû ku berîya Zerdeşt Ehûremezda pê re axivî û dîne Zerdeşt jê re nazil kir. Cem dînzane û dîndariyê qebûl nake, lê ew qebûl dike ku cîhana Ehûremezda afirandî ji bo mirovan mezin û şanazî ye. Cemşîd di serdemeke zêrîn de padişahiya cîhanê dike. Bi serwerîya wî, ne bayê sar wê hebe, ne bayê germ, ne jî nexweşî û mirin. Bi pêşkêşiyên Ehûremezda, ew dibe serkeftiyê serweriyê. Di serdema wî de, erd ji kerî û ajel û mirov û kûçik û balindeyan tijî dibe. Cem jî vî erdî mezin dike. Cemşîd li peravê cemê Daytiyayê li welatê Arîyan ê herî destpêkê navdar bi yezdanên mînûyî re dicive. Wê demê Ehûremezda ji Cem re dibêje ku zivistana herî xirab wê di ser cîhana Estûmend re were ku zivistaneke dijwar û kujer e. Wê Îdergo Spendan ji sê aliyan ve werin: Yên ku li cihên herî tirsnaq in; yên ku li ser çiyayan in û yên ku di kûrahîya gundan de ne. Nexwe tu, ya Cem! Wê Verê çêke. Her yek ji çar berên wê bi qasî dirêjahîya Esprîsî çêke û tovên kerî û hêstir û mirov û kûçik û balinde û agirê sor bibe wir. Cem çawa Ehûremezda gotibû, Ver çêdike û gotinên Wî bi cih tîne û wusa mirov û ajel û nebatan diparêze (Avesta, 2021, 396-400). Di heman demê de navê wî di metnên Pehlewî de di nav nemiran de derbas dibe (Minavi Xired, 1354, 23).

Li vir divê bê gotin ku piştî hatin û belavbûna îslamê li erdnîgarîya Îranê, her çend piranîya xelkên ku li vî erdnîgarîyê dijîn ev dîne nû qebûl kiribin jî, baweriyên mîtolojîk/dînî ku ji demên kevnar ve di bîrên kolektîf ên çandî/rewşenbîrî yên xelkê de bi cih bûbûn, di vî bîrê de dom kirine û di çarçoveya sembolan/bawerîyan de di gelek warên çanda îranî de, di bin kirasên nû de jî nû ve derketine holê. Qada herî girîng jî bo vejîna mîtoloji û kesayetên mîtolojîk ên berîya Îslamê jî bêguman şaxên cuda yên edebîyatê bû. Padişah, leheng û hebûnên mîtolojîk bi kirasên nû ji destan û edebîyata gelêrî heta metnên tesewîfî carek din bûne xwedî roleke bingeîn.

Cemşîd jî, wekî kesayetekî mîtolojîk di berhemên cuda yên çanda Îranê de jî nû ve xwe nîşan dide. Lê divê bê zanîn ku di serdema îslamî de behsa Cemşîd, padişahî û serpêhatiyên wî tenê bi berhemên edebî ve ne sînordar e. Pirtûkên tarîxa îslamê yên wekî *Exbar 'ul-tewalê Dinewerî*, *Tefsîrê Teberî*, *Zeyn 'ul-Exbarê Gerdîzî*, *Mucmel 'ul-tewarîx*, *Tarîxê Bel'emî*, *Asar 'ul-baqîyeyê Bîrûnî* jî behsa wî dikin.

Di edebîyata serdema îslamî ya Îranê de yek ji berhemên herî nasrav ku behsa kesayet û padişahiya Cemşîd dike, Şahnameya Firdewsî ye. Li gorî Şahnameya Firdewsî, Cemşîd cihê bavê xwe digire û dibe padişah. Wexta ku Cemşîd derdikeve ser textê bîriqî, taca wî ya zêrîn li ser serê wî ye û di nav îhtîşama padişahiye de ye û gerdûn xwe teslîmî wî dike. Bi rêberîya wî, dinya aram û bê pîrsgirêk dibe. Çûk û perî guh didine wî. Textê padişahiye yê dibiriqê di bin wî de ye, demeke dirêj dijî û serwerîya wî hefsed salan berdewam dike.

Di rîwayeta Firdewsî de Cemşîd wekî ronîya Xwedê tê nîşandan. Ew şah e û di heman demê de xoşewîst e, ruhan ber bi ronahîyê ve dibe. Li gorî Şahnameya Firdewsî Cemşîd hewl dide ku ji rewşa xwe jî bilindtir bibe. Textekî ava dike û nava wî bi kevirên biqîmet çêdike. Bi fermana wî, dêw textî ji erdê radikin û ber bi sêla esmanî ve bilind dikin. Ew roj wekî “Newroz” ango wekî serê salê tê diyarkirin. Tê gotin ku, dema ku Cemşîdê “xwedî hemû hêz û îhtîşamê” tê Azerbaycanê, roj di asta yekemîn a birca Beranê de bû; ronahîya wê tac û textê Cemşîd hembêz kir (Sohravardî, 1976, 331).

Lê ev hêz û şan dibe sebeb ku Cemşîd hêdî hêdî ji Xwedê dûr bikeve û dikeve jî û xwe wekî afirînerê cîhanê dibîne. Wê demê “lutfa ilahî” jî bedena wî derdikeve û nelihevhatinek dikeve nav cîhanê. Cemşîd tac û textê xwe wenda dike û di dawiyê de bi destê Zehak tê kuştin (Firdewsî, 1997, 41-53).

Ji xeynî taybetî û serpêhatiyên Cemşîd ku li jorê bi kurtasî hatin behskirin, xala herî girîng di kesayetîya wî de xwedîbûna wî ya “Camê Cem” e. “Camê Cem” ku jî du peyvên Cam û Cem pêk hatiye, di avestayî de wekî Yâma (Bartholomae, 1904: 1264) û di Pehlewî de jî wekî Jâmag (MacKenzie, 1971, 46) an Yâmak (Nyberg, 1974, 225) bi wateya zerf û cil hatiye bikaranîn, di mîtolojiya îranî de wekî objeyeke metamorfozê tê nirxandin (Restgar Fesayî, 1381, 152).

Di rîwayetên îranî de bi giştî sê taybetî jî bo Camê Cem hatine nîşandan: Vexwarin, pêwendî bi ruhên bav û kalên mîrî re û cîhannumayî. Li vir divê bê gotin ku digel ku Camê Cem di metnên serdema îslamî de xwedî cihekî girîng

e, lê di metnên îranî yê berîya îslamê de behsa Camê Cem, rasterast nehatiye kirin. Di heman demê de çawa Cemşîd bû xwedî Camê Cem jî bi zelalî nayê zanîn.

Di pirtûka *Dînkêrd* a sêyemîn de derbarê Cemşîd de rîwayetek heye (Madan, 1911, 295-297). Li gorî rîwayeta navborî, berî ku Cemşîd were ser textê padişahiye, Asin Xired (aqil/hikmeta xwerû ku pîvana îtidalê ye) ji aliye dêwan ve tê dizîn. Ji ber tunebûna îtidalê jî karê dinyayê tevlihev dibe. Cemşîd bi îradeya Ehûremezda tê ser textê padişahiye û bi lutf û îcaza Wî diçe dogehê. Ew sêzdeh zivistanan li wê derê di nav dêwan de derbas dike û dawîyê Asin Xired, bi alikariya Ehûremezda jî dêwî xilas dike û vedigerîne cem Wî di nav xelkê de belav dike (Bahar, 1362, 172-173). Lê wekî Tefezzolî jî dibêje, di metnên pehlewî de nayê diyarkirin ka çawa Ehrîmen/dêw ew daqurtandîye û birîye dogehê (Minavi Xired, 1354, 124) Di risaleya *Mah Ferwerdîn Rûz Xurdad* de, ku risaleyeke din a pehlewî ye, tê gotin ku Cemşîd Peymane ji dogehê veqerandîye (Asana, 1371, 141). Tê zanîn ku peyva Peymane, di çarçoveyên cuda de, xwedî du wateyan e: pîvan û qedeh. Ji ber vê yekê, dikare bê texmînkirin ku peyva Peymane ku di metna pehlewî ya jorîn de hatiye bikaranîn, di eslê xwe de Cam/qedehê temsîl dike. Li gorî rîwayetên din jî Cemşîd bi destê zanayan qedehek wisa daye çekirin ku bi vê qedehê hemû bûyerên cîhanê dikarin bên dîtin (Uşîderî, 1383, 231). Li gorî hin rîwayetên zerdeştî jî ji ber ku Cemşîd ji vê dinyayê derbas dibe, ev Camê Cem jê re tê pêşkêşkirin (Newwabî & Camasb Asa, 1355, 135).

Firdewsî di bûyerên serdema padişahiya Cemşîd de, qet behsa Camê Cem nake. Li gorî rîwayeta wî, Key Xusrew carekê Camê Cemê ji bo dîtina Bîjenê Gîw bi kar tîne. Li gorî rîwayeta Firdewsî, Key Xusrew li benda *Newrozê* dimîne û di wê roja şahîyê de kirasê xwe yê taybet li xwe dike û diçe da ku xwe pêşkêşî Xwedayê cîhanê bike. Demeke dirêj li ser *Camê* birîqî şikir dike, jê hêvî û lava dike, li hemberî Ehrîmen ‘edaletê dixwaze. Piştî vedigere qesra xwe, taca padişahiye datîne ser serê xwe û Camê Cemê digire destê xwe. Heft welatan dibîne, yên ku jê derbas bûye û şiklê esmanê mezin dibîne. Sûretê hemû cîhanê û yê bircan û di binê wan de jî heyvê dibîne. Piştî Key Xusrew bi hunera xwe ya efsûnî pêşerojê dibîne. Dawîya dawî dibîne ku Bîjen di nav çalekê de ye (Firdewsî, 1992, 344-346). Ev sehne, sehneya dawî ye ku Firdewsî behsa Camê Cem dike, digel ku li gorî hin berhemên farisî, Camê Cem ku qedeheke mensûb bi Cemşîd bû, heta serdema Darabê kurê Behmenê kurê Îsfendîyar, di destê padişahên Îranê de bû (Bexdadî, 1382, 110-111).

Di rîwayetên kurdî de, yekem kesê ku xwedîyê Camê Cem bûye, Keyûmers e (Kendûleyî, 1369, 227). Lê ev rîwayet li ser çêbûn an bikaranîna Camê Cem jî aliye Keyûmers ve agahîyekê nadin. Piştî Keyûmers, kesayetê ku dibe xwedî Camê Cem, Qehreman/Kerîman e ku li gorî hin rîwayên Şahnameyên Kurdî, bapîrê bapîrê Rustemê Zal e (Valî & Ölmez, 2022, 311-313) ku bi alikariya Sîmurx, dibe xwedî Camê Cem (Hemzeyî, 1393, 892).

Piştî Qehreman di rîwayetên kurdî de kesê ku navê wî wekî xwedî Camê Cem derbas dibe Cemşîd e. Li gorî rîwayetên kurdî dema ku dibe dewra padişahiya Cemşîd, hemû xelayıq fermanberîya wî dikin. Dema ku Cemşîd Camê Cîhanbîn di destê xwe de werdigirt, her tişt di vê camê de bo wî eyan û beyan dibû. Di heman demê de îhtişam û şana wî jî ji Camê Cem dihat (Kakawend, 1380, 58-60).

Li gorî rîwayetên kurdî jî Cemşîd ji ber sedemên ku berê hatin gotin şana xwe ya îlahî wenda dike û bi destê Zehak tê kuştin. Piştî mirina Cemşîd heta serdema Key Xusrew, behsa Camê Cem nayê kirin. Di van rîwayetan de ev Cam li binê deryayê dimîne heta ku Key Xusrew wê bibîne û bibe cem xwedîyê wê (Emînî, 2010, 170). Bi wî awayî Key Xusrew dibe xwedîyê “Camê Gîtînemay”. Wisa Key Xusrew çî bixwesta dikarîbû tê de bidîta, haya wî jî her tiştê veşartî çêdibû û ji kaînatê agahdar dibû.

Bikaranîna Camê Cem a ji aliye Key Xusrew ve, di rîwayeta Firdewsî û yê Şahnameyên Kurdî de wekî hev e û di çîroka *Bîjen û Menîje* de derbas dibe. Di sê versiyonên cuda yê çîroka *Bîjen û Menîje* yê kurdî de Key Xusrew ji bo dîtina Bîjenê biryar dide ku li Camê Cemê binêre. Ji bo vî karî jî li benda *Newrozê* dimîne. Dema ku roja *Newrozê* tê, Key Xusrew piştî du’ a û ayînên taybet, li Camê Cemê dinêre, sûretê hemû cîhanê û heft welatan dibîne û dawîya dawî dibîne ku Bîjen di nav çalekê de li Turkistanê ye (Lutfîniya, 1399, 125-126).

Di rîwayetên kurdî de cara dawîyê ku şopa Camê Cem tê dîtin, di rîwayeta *Behmen û Feramerz* de ye. Li gorî rîwayetê dema ku Behmenê Îsfendîyar diçe goristana malbata Rustemê Zal, dibîne ku di bin serê her cenazeyekê de lewheyek ji gewher û nivîsek heye ku kirinên Behmen ên li hemberî malbata Rustem şermazar dike. Lê di nivîsa ku li ser lewheya li bin serê Rustem e, ji xeynî şermezarkirina kirinên Behmen, agahîyeke din jî heye. Li ser lewheyê Rustem dibêje ku di bin serê wî de gewhereke “şevçîrax”, ji serdema Tehmûres û Cemşîd, wekî mîras jî sirra xezaneyê Key Xusrew ketîye destê wî (Ekberî, 2009, 57).

Digel ku di berhema navborî ya li jorê de rasterast navê Camê Cem nehatiye behskirin lê em dikarin bêjin ku bi ihtimaleke mezin mebest ji “gewherê şevçîrax” ku wekî “sirê xezaneyê” Key Xusrew tê behskirin, heman Camê Cem e. Ji ber ku di edebîyata îranî de “gewherê şebçîrax” ku wekî “durrê şebgûn”, “gewherê şebtab” an “gewherê

şebefrûz” jî tê binavkirin, wekî sembola ronahî û qencîyê tê bikaranîn û di rîwayetên îranî de cihê wê jî çiyayê Qafê ye (Yaheqqî, 1386, 711). Di heman demê de di *Behmennamê* de jî heman rîwayeta *Behmen û Feramerz* a kurdî derbas dibe, bi cihê “gewherê şevçirax”, rasterast behsa Camê Cem tê kirin (Îranşah bin Ebilxeyr, 1370, 434).

2. Di Nêrîna Mutesewîfan de Cemşîd û Camê Cem

Digel ku qada bikaranîna Camê Cem, wekî motîfeke mîtîk, bi piranî berhemên destanî ne, lê dikare bê gotin ku ev qad di coxrafyaya çandî ya Îranê de, bi berhemên destanî ve sînordar nîne (Vali, 2023, 130). Di edebîyata Îranê ya serdema îslamî de, kurdî an farisî, yek ji qadên ku kesayet/heyamên mîtolojîk tê de hatine bikaranîn, edebîyata tesewîfî ye.

Şairên mutesewîf ên faris ên wekî Senayî, ‘Ettar, Mewlana û Hafîz û şairên kurd ên wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Nalî û hwd. di helbestên xwe de behsa Camê Cem wekî “Camê Gîtînuma”, “Camê Cîhannuma”, “Ayîneyê Cîhannuma” di wate û konteksteke taybet de, dinivîsin û wê bi kar tînin. Digel ku Cemşîd, wekî hat gotin, padişahêkî “ketî” ye (Heras, 1953, 150177), lê dîsa di metnên pehlewî û edebîyata serdema îslamî de, bi taybet di edebîyata tesewîfî de, wekî sembola îhtîşamê hatiye teswîrkirin.

Şehabeddînê Suhrewerdî di risaleya *Luxetê Mûran* de behsa Key Xusrew û Camê Cem dike. Li gorî wî jî: “Key Xusrew xwedî Camê Gîtînuma bû. Çi bixwesta dikarîbû tê de bidîta, haya wî ji her tiştê veşartî çêdibû û ji kaînatê agahdar dibû. Dibêjin ku di şeklê qûçê (konî) de bû û qilifeke wê ya çermîn hebû ku bi deh benikan dihate girêdan, dema ku dixwest ji xeybê tiştêkî bibîne, dema ku roj rast (îstîva) dibû, qedeha xwe ber bi wê ve digirt, wexta ku ronahîya herî mezin diçûrîsî, hemû qeder û xêz jê re xuya dibûn (Suhrewerdî, 1372, 299). Suhrewerdî gotina xwe bi ayetên bi vî rengî piştrast dike; “Dema ku erd dirêj û rast (û mişt) bibe û...Yên ku di nav xwe de biavêje û xwe vala bike. Herwiha gava erdî li fermana Rebbê xwe guhdarî kir û pêdivî bû ku ew guhdariya fermana Xwedê bike. Hey însan! Bi rastî tu bi bal Xwedayê xwe ve bi cehd û xebatê, xwe diwestîni, vêca tu yê bigihîjî xebata xwe” (Qur’ana Pîroz, sûreyê el-Înşîqaq, ayetên 3-6, 590). “Kes ji we nayê veşartin (Qur’ana Pîroz, sûreyê Haqqe, ayeta 18, 568). “Hingê herkes dê bizane ka çi li pêşîya xwe şandîye û çi li dûv xwe hiştîye” (Qur’ana Pîroz, sûreyê Infîtar, ayeta 5, 588).

Li gorî rîwayeteke din, dema ku Camê Cemşîd digihîje Key Xusrew, ew ji zanayan dipirse: gelo heqîqeta vê Camê çîye? Dibêjin, em nizanin. Key Xusrew cameke din wekî Camê Cemşîd dide çêkirin. Dema biharê ku ronahîya her du Caman temam e, Key Xusrew ji wan gelek remzên xeybî werdigire. Cam, nîşana hikmet û aqilê ronîbîn bû. Li ser Camê heft xet hebûn. Bi van xetan, sirên cîhana xeybê dihatin kifîşkirin. (Şîrwani, 1339, 84-160).

Girêdayî rîwayeta li jorê, Hafîzê Şîrazî jî di xezeleke xwe de behsa “xetên li ser Camê” dike ku “Pîr” bi wan rêzan re dikare qeder û encama dinyayê bibîne:

“Pîrê meyxane şeva borî muammayeke dixwend

Ji xetê Camê ka encam wê çi be” (Hafîzê Şîrazî, 1389, 252).

Di îrfana îslamî de Camê Cem, xwedî cihekî girîng û wateyên cuda ye û bi navên wekî “Camê Gîtînuma”, “Camê Cîhannuma”, “Ayîneyê Cîhannuma” û hwd. hatiye behskirin û bi piranî “Cam” û “neynik” bi heman wate û wekî heman tişt hatine bikaranîn.

“Sibehê Pîrê meyxane ew Cama Cîhanbîn da min

Bi vê neynikê wî haya min ji cemala Te da” (Hafîzê Şîrazî, 1389, 233).

Wateya herî girîng a vê jî “dilê însanê kamil e ku her çi ji deryaya ‘alema xeybê bê, da ku bigihîje beravê “he-bûn”ê, wêneyê wê dikeve dilê însanê kamil û wî ji her tiştî agahdar dike (Nesefî, 1962, 238). Li gorî Nesefî, însan bi xwe “Ayîneya Gîtînuma” ye û herkes bi xwe, “camek”ê lê însanê zana “Camê Cîhannuma” ye:

“Ji bo dîtina Camê ez geriyam

Ez rojekê rûnenîştîm, şevêkê jî nerazam

Dema ku min wesfa wî ji mamoste bihîst

(Min dît ku) Ev Camê Cîhannuma yê Cem ez bi xwe bûm” (Nesefî, 1962, 146).

Heman nêrîn di helbesta Hafîzê Şîrazî jî hatiye teswîrkirin:

“Bi salan dil ji me Camê Cem dixwest

Tîştê ku bi xwe xwedî bû, ji kesekî din dixwest

Min got, Hekîm kengê ev Camê Cîhanbîn da te

Got roja ku Wî ew qubbe çêkir” (Hafîzê Şîrazî, 1389, 94).

Li gorî Mewlana jî ruhê însanê kamil neynika cemala îlahî û bedena wî jî Camê Cîhannuma ye:

“Rûhê wî neynika cemala îlahî ye

Di meclîsa ‘îşqê de cisma wî Camê Cîhannuma ye” (Mewlana, 1376, 1303).

Lê ji bo ku însan bikare bibe xwedîyê Camê Cem, yan ji sirên wê agahdar bibe divê “ axa meyxaneyê ‘îşqê îlahî bike kilê çavan (Hafîzê Şîrazî, 1389, 95) zîra “Camê Cem ji bo kesê bêbesîret, ne sûdmend e (Hafîzê Şîrazî, 1389, 291).

Yanî bi giştî dikare bê gotin ku di nêrîna îrfanî de Camê Cem nîşane û sembola dilê agah, neynika Heqq e û tîrêja can di dilê însan de wekî tîrêja tavê di Camê Cîhannuma de ye (Burûmend, 1376, 141).

3. Di Helbesta Melayê Cizîrî de Cemşîd û Camê Cem

Di edebîyata kurdî ya tesewîfî de yek ji şairên payebilind ku di helbestên xwe de gelek caran cih daye kesayet/heyamên mîtolojîk, Melayê Cizîrî ye ku helbestên wî wekî lutkeyeke di edebîyata kurdî (Dokî, 2021, 25) ya tesewîfî de tê qebûlkirin. Dîwana wî ji serdema wî heta bi roja me li seranserê Kurdistanê di medrese û cemaetên kurdan de hatiye xwendin. Gelek helbestvanên kurd di helbestên xwe de di bin bandora Mela de mane, ew di hunera xwe de wek model wergirtine û şewaza wî ya edebî şopandine. Dîwana Mela hem berî derketina çapxaneyê, hem jî piştî wê gelek caran wek destnivîs hatiye istînsaxkirin/kopîkirin û ji salên 1900î heta bi roja me gelek caran di çapxaneyan de hatiye weşandin. Dîsa, ji bo dîwanê gelek şerh hatine nivîsîn û di zimanên din de wergerên wê jî hatine kirin (Adak & Acar & Aykaç, 2017, 174). Di heman demê de Melayê Cizîrî di nav edebîyata kurdî de ji şairekî mîstîk wêdetir, wekî kanonsazekî (Sezer, 2021, 3-23) ku hem bi vegotina şîrên xwe ve hem jî bi poetîkaya xwe ve, ev yeke eşkere kirîye. Yanî *Dîwana* Mela, wekî metneke edebî, ji lêkînanana mezmûnên tesewîfî zêdetir tiştan dibêje (Tek, 2019, 9-10). Lê Mela berî her tiştî mutesewwîfek (Azarkan, 2023, 619) e ku ji şêxekê Tekkeyê zêdetir, xîtabî ‘alîm û sofîyên berceste dike (Kavak, 2015, 53) û tesewîf û nêrîna tesewîfî hertim wekî çavkanîya herî girîng a îlhama Mela tê qebûlkirin. Zîra Melayê Cizîrî di ramana xwe ya felsefî de nêzî felsefeya tesewîfî û cîhanbînîyeke îşraqî ye ku îlham û îşraqê wekî çavkanî dipejirîne, ne aqil û qiyasê ku jêderên zanîna rasyonel in. Ji ber vê jî ne mimkin e ku mirov *Dîwana* Melayê Cizîrî ji çanda tesewîfî cuda bihesibîne û fêhm bike (Doru, 2016a, 25-30) û dikare bê gotin ku dîwana wî jî têgehên bîngêhîn ên tesewîfî pêk tî (Alkış, 2014, 2).

Xwendina helbestên Melayê Cizîrî û kûrbûna li ser helbestên wî nîşan dide ku ji xeynî ramana tesewîfî, ku çavkanîya bîngêhîn a wî ye, mîtolojî jî, wekî hîkmeta zewqî (Çalî, 2008, 217) dikare wekî jêdereke muhim a ramana wî, her wekî hin şairên din bê hesibandin. Bikaranîn û hizûra padişah û lehengên mîtolojîk ên wekî Keyxusrew, Dara, Peşeng, Rustemê Zal, Gîw û Efrasiyab, afirîdeyên mîtolojîk ên wekî Teyrê Homa, bûyerên mîtolojîk ên wekî Newrozê, coxrafayên mîtolojîk ên wekî Çiyayê Qafê an hêmanên mîtolojîk ên wekî Ayîneya Îskender dikarin wekî delîla vê nêrînê bînin nîşandan.

Melayê Cizîrî, wekî gelek mutesewwîf/şairên din, di helbestên xwe de kesayet/hêman/bûyerên mîtolojîk di konteksteke mîstîk, bi hermenotîkeke kûr ve bi kar anîne û qala wan kirîye. Yek ji padişahên mîtolojîk ku di helbestên Mela de pir caran hatiye behskirin, Cemşîd û Cama wî ye (Kırkan, 2021, 309-311).

Di helbesta Melayê Cizîrî de navê Cemşîd/Cem ligel çend kesayetên din hatiye bikaranîn (bnr. Çelikaş, 2021, 263-289). Hin ji van kesayetên mîtolojîk ên wekî Key Xusrew; padişahê mîtolojîk û arketîpa desthilatdarê îdeal û Rustemê Zal; arketîpa lehengê îdeal, hin ji kesayetên tarîxî ne wekî, Xizirê Peyxember, Dara padişahê Îranê, Îskenderê Mezin, Hemze bin Abdulmutallib, Elî bin Ebûtalib û Xalid bin Welîd. Kesayetên navborî di helbesta Mela de wekî “yar” hatine behskirin (Tek, 2023, 101) û di tarîxa îslamê de her sê kesayetên dawî yê navborî jî sembola îhtişam û serkeftinê ne.

“Çi hedê sed hezar can bin di fitraka hebîbê min

Ku sed Cemşîd û Key Xwisrew xulam in ser deve rê da” (Cizîrî, 2013, 11-14).

“Abê heywan te diwêtin tu bibe hemrehê Xizr

Camê Cem bîn û ji Dara û Skender meke behs” (Cizîrî, 2013, 32-33).

“Rostem û Cemşîd û Xalid Hemze yan Şêrê Elî

Aferîn ya şehsiwarê tirk û rimbazê ereb” (Cizîrî, 2013, 18).

Di nav van kesayetan ku di helbesta Melayê Cizîrî de ligel Cemşîd hatiye zikirkirin, Îskenderê Mezin balkêştir e. Divê bê gotin ku di çanda îranî de Îskenderê Mezin xwedî du teswîrên cuda û berevajî ye. Di metnên Îrana beriya îslamê de, ku aîdê bawerîya Mezdeyesnî (zerdeştî) ne, bi taybet di metnên pehlewî yên serdema Sasanîyan de, Îskender dijmeneke êrîşkar e ku her tiştî wêran dike û bi sifeta “guceste”(mel’ûn) navdar e. Sedema xwezayîya vê nêrîne ji bêguman êrîşa Îskender a li ser Îranê û bi taybetî derbeya li ser bawerîya Mezdeyesnî ye.

Lê di edebîyata serdema îslamî ya Îranê de, wêneyekî din ji Îskender hatiye teswîrkirin ku tu têkilîya wî bi kesayetiya wî ya tarîxî re nîne. Di hin berhemên serdema îslamî de tê dîtin ku Îskender wekî şehzadeyekî esilzade ji nesla Keyanî, bi heybet û şervanekî bihêz û cihangîr ku li Ava Heyatê digere, hatiye teswîrkirin. Nimûneya herî nasrê ji van metnan jî *Îskendernameya Nîzamî* ye (Nîzamî, 1373). Di heman demê de kesayetiya wî bi kesayetiya Zulqerneyn re bûye yek, yê ku di Qur’anê de behsa wî hatiye kirin (Qur’ana Pîroz, sureyê Kehf, ayetên 83, 86, 94). Di metnên navborî de Îskender xwedî neynikeke taybet e bi navê *Ayîneya Îskenderî*. Di edebîyata îranî ya serdema îslamî de, bi taybetî edebîyata tesewîfî/îrfanî de, ev *Ayîneya Îskenderî* û *Camê Cihanbînê* gelek caran wek heman tişt hatine bikaranîn.

Derbarê çibûna *Ayîneya Îskenderî* de tê gotin ku li bajarê Îskenderîyeyê, ku avakirina wî bi Îskenderê mezin re tê mensûbkirin, çirayeke behrê hebû ku ji aliyê Batlamyus ve hatibû çekirin. Di serê vê avahîyê de, ku wekî yek ji ecaîbên cîhana kevnar tê qebûlkirin, neynikeke bi navê “Neynika Îskenderî” hebû ku heta dema Welîd bin Ebdulmelik (m. 715) jî li ser pêyan bû (el-Dîmeşqî, 1866, 36-37).

Li gorî rîwayeteke din, Îskenderê Mezin ji bo ku hay ji serhildanên gelê Ferengê hebe ev minare çekir û neynika ku bi hikmet û tilisman ji aliyê Arîsto ve hatibû çekirin, da serê minareyê û cerdevan li serê wê wezîfedar kirin. Bi vê tedbîrê wî şîya du caran artêşên Ferengê tîk bibe. Lê di serîhildana sêyem de artêşa Ferengî ji xemsarîya cerdevanan sûd wergirt û bajarê Îskenderîyê dagir û wêran kir û ew neynik jî avêt behrê. Gava Îskender hay ji vê yekê bû, ew tîk birin û Arîsto neynika jî behrê derxist û dîsa da ser minareyê (Borhan, 1342, 74) Nîzamî jî di *Îskendernameyê* de behsa Neynika Îskender dike û dibêje ku ji aliyê wî ve hatiye çekirin (Nîzamî, 1373, 71-74).

Dikare bê gotin ku hema bêje di hemû wan rîwayetan de ku li ser vê neynikê hatine vegotin, wateyên dûrbînî, cihanbînî, dîtîna tiştên veşartî û dîtîna pêşerojê wekî taybetîyên wê hatine vegotin. Yanî heman taybetîyên ku di edebîyata cîhana îranî de ji bo Camê Cem hatine dîyarkirin. Dibe ku ji ber vê yekê be ku ev her du tîgeh, *Camê Cem* û *Ayîneya Îskender*, di berhemên edebî de bi gelemperî bi hev re hatine bikaranîn (Yaheqqî, 1386, 65-66).

Di helbesta Melayê Cizîrî de jî Cemşîd û Cama wî, ligel Îskender û neynika wî bi hev re hatine zikirkirin. Her du kesayet wekî sembolen îhtîşamê ne û xwedî pîvaneke manewî ne û nîşana vê pîvana manewî jî *Cam/Ayîne* ye. Di helbestên Melayê Cizîrî de li ser Cemşîd/Îskender û *Cam/Ayîne*, yekem tiştê ku balê dikişîne behsa îradeya îlahî ye. Mela dibêje:

“Îsmê te ye mektûb-i di dîwanê qedîm da

Herfek qelemê ‘ilmê bi teqwîmê reqem da

Eşkal û xetên daîreyê nuqtayê ‘ilm in

Ev neqş û misalên di xeyalatê ‘edem da

Mîm metle’ê şemsa ehed ayînesifet kir

Lami’ji ereb berqê li fexxarê ecem da

Da şahide esma bi hemî wechî binasin

Yek mestê Samed kir bi yekî neqşê senem da

Yek girtiyê zulfê we yekî xalê numayî

Ayîne bi Îskender û Camê bi Cem da

Erwahê muqeddes şebê qedran te dixwazin

*Nûra te ye mîsbahê di qendîlê Herem da
Da weqtê lîqayê bi te hey bin di beqayê
Min neqdê dil û can di fenayê bi selem da
Yaqûtîfiroşan di kef elmas-i şikestin
Ev sefheyê elmasî ku neqqaşî reqem da
Ya Reb jî çî rû leb bi senayê te kuşayem
Subhaneke len uhsiyefî şe'nîke hemda
Minnet ji Xudayî ku bi 'ebdê xwe Melayî
Îksîrê xemê 'îşqê ne dînar û direm da" (Cizîrî, 2013, 3).*

Wekî tê dîtîn, li gorî Melayê Cizîrî, Pêxember wekî cihê hilatîna roja yekîtîyê (wehdaniyet), wekî neynikeke zelal û rohnî ye ji bo kesên ku Xwedê bixwaze ew bêne ser rêya rast. Li gorî Mela, Xweda bi afirîdeyên xwe re tevgerên cuda kirine, da ku ew afirîde bi her awayî delîl û diyardeyên nav û xesîyetnavên wî bizanin û wî binasin. Ji ber vê jî Xwedê yekî tîne ser rêya rast ya eşqê û wî/wê bi evîna xwe dilxweş û şad dike û yekî jî dixê ser rêya çewt û şaş ta ku ji rêya rast aware bibe. Ji bo hin hikmetan, ku hiş nagihîje sedem û bîngêhên wan, Ayîne (neynika fiqzelal) daye Îskender û pîyaleya badeyê ya nebînayî (Cam) jî daye Cemşîd (Zivingî, 2013, 100, Hejar, 1361/ 1982, 10).

Wekî berê jî hat diyarkirin, di metnên îrfanî de bi piranî Cam û ayîne/neynik bi hev re û wekî heman tiştî hatine bikaranîn û xwedî feyzeke îlahî ne (Hafîzê Şîrazî, 1389, 161). Melayê Cizîrî herwekî em ê di nava metnê de bibînin, di helbestên xwe de, bi awayekî bêhempa, mebesta xwe ji wateya Cam/ayîneyê vebeyan dike. Mela vebeyan dike ku husn û muhabbet, me'sûq û 'aşîq, zatek in, di wateya xwe de û rabbitaya wan wekî rabbitaya sûret û neynikê ye. Yanî 'aşîq û maşûq yek in û her yek ji wan jî neynika a yê/ya din e (Polat, 2020, 35).

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de behsa yekbûna heqîqet-xeyal, yekîtî-pîrbûnê bi metafora neynikê tîne ziman (Doru, 2016b, 20). Li gorî wî pîrbûn/pîrjimarî ya ku di 'alemê de tê dîtîn, tenê xeyal e û heqîqet/rastî tenê Ew e. Me'sûq, heqîqet e û sureta Wî, di neynikê de ku 'aşîq e, xwe eşkere dike. Pêwendîya di navbera Hebûna Mutleq û xuyabûnên Wî de, wekî pêwendîya sûret û xuyabûna wî ye di neynikê de. Çawa ku wêneyê sûret di neynikê de ne rastîya sûret bi xwe ye, bi heman şiklê 'alema hebûnê ne Hebûna Mutleq bi xwe ye. Tişt, neynika esma û sîfatên îlahî ne, çavkanîya van jî Zatê îlahî ye û di cewhera xwe de Heqîqeta tekane ye. 'Alema hebûnê jî wêne an sîya Wî ye û jixwe hebûna vê wisa pêk tê. Lê 'alema hebûnê li hemberî Hebûna Mutleq xwedî tu rastîyekê nîne û tunebûnek e (Doru, 2016b, 67). Yanî pêwendîya wan hem pêwendîyeke eynîyet û hem jî pêwendîya xeyrîyetê ye (Doru, 2016b, 75). Yanî 'alem bi xwe tune ye (mewhûm û la-şey'e) û tenê neynika wêne û xeyalên Esmayê Heq e, wekî ismek ku ji masdarê, munşeq bûye. Dema ku deryayê rehmet û cûdê îlahî, bi îradeya Wî, di neynika navê Xweda (Wedûd) de tê coşîşê, ji tecellayê nûra Wî, "hebûn" watedar dibe. Ew sûretê neynika cemal û husnê, ji ayatê husnê zuhûr dike. Çavkanî û serçeşmeya tecellayê husn jî bêguman nûra munezzeh û pak a Muhemedî (Ehmedî) ye ku sira sîfatên cavîd û ebedî (sermedî) û neynika kifşa kemalatê îlahî ye. Çawa ku Ertekin jî destnîşan dike, Mela di dîwana xwe de behsa cureyên cuda yên tecelliyatan dike; wekî Tecellîya Sûrî (tecelliyatên cemala Xweda di dema xerqbûna di nava 'îşqê ya di beşeran/kesan de), Tecellîya Ef'alî (tecellîya Xweda ya ku bi sîfetê fi'lî û bi nûrên kesk, hişîn, sor, zer û spî tîne ser dilê salikan), Tecellîya Sîfatî (zahîrbûna Xweda bi sîfetên xwe yên seb'e, yanî sîfetên ezêlî, bi ber dilê salikî), Tecellîya Zatî (ku salik di zatê Xweda da fanî/tune dibe û ji hêza zanînê, kirînê û şîûrê wî tiştek namîne) (Ertekin, 2021, 206-207) û hemû hebûn qadên tecellîya ciwanîya Îlahî ne (Eminoğlu, 2022, 108). Yanî hemû "hebûn" neynikek e ku wêne ya Cemala Îlahî tê de xuya dibe (Tenik, 2017, 100).

Li gorî Melayê Cizîrî cihê ku neynika nûra Heq ku ev ronahî tê de cilwe dike û sûretdar dibe jî 'aşîqê rastîn, yanî insanê kamil e.

*"Me'nayê 'îşqê bêm çî ye lew min bi çeşme dil diye
'Eksa cemalek safî ye lami' di mir'ata me da
Husn û mehebbet zatek in me'sûq û 'aşîq latek in
Lê suret û mir'atek in her yek di me'nayê xwe da"
Ger dilber û wer 'aşîq in 'arif di vê da sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cih cih di wan de cilwe da"*

“*Alem bi ‘alem ew neseq bû ayîne esmayê Heq*
Nûra tecellayê teteq ‘eks û xiyalek sade da
Em têk hewiyyat in yeqîn ismen ji mesder munşeq in
Mewhûm û la-şey’ mutleq in ‘eks in di nêv ayîne da”
“Ew bû murada Kirdigar lew kir îrade w ixtiyar
Vî buxçeyê her lê buhar gulgeş di baxê xunçe da
Behra wucûdê coş-i hat nûrek tenezzul bû ji zat
Hatin te’eyyûn têk sîfat eşya zuhûr ‘ilmiye da”
“Coşîş ku da deryayê cûd di ayineya ismê Wedûd
Carek tecella bû wucûd fûrek ji nûrê jê veda”
“Ew sûretê mir’atê husn jê bû zuhûr ayatê husn
Lê bû tecella zatê husn vê husnê ew serçeşme da
Serçeşmeya husnê ew e xwurşîd e ‘alem pertew e
Ger bedr e wer mahê new e wer Muşterî yan Zuhre da
Nûrê ji nûra Ehmedî sirra sîfatên sermedî
Di ayineya zatê xwe dî keşfa kemalatê xwe da”
“Durdaneyên xawermisal ayineyên têda şemal
Nûrek munezzeh ew cemal mey kir di nêva şîşe da”
Roj bû di nêva neynikê katib ji herfê ‘eynikê
Nêv goşeya qewseynekê tuxra bi ismek taze da”
“Ayineyê zatê yek in lew dilber û latê yek in
Vêkra di mir’atê yek in hem taze taze ‘işwe da”
“Ew reşhe da wê qulzumê mey hate tasa ‘alemê
Cama cehanbîn da Cemê bi Eskenderî ayîne da
‘Eksa ji husna meyfiroş avête fincanên bi poş
Nageh di caman hate coş fûrî di nîva kûze da” (Cizîrî, 2013, 195-202).

Di edebiyata tesewîfî de dilê arîf an însanê kamil ku cilwegah û cihê tecellayê cemala Heqîqet e wekî Cam hatiye tabîrkirin. Ev dil mexzen û xezîneya sirên îlahî ye û xwedî ye. Ev dil, Camê Cîhannumayê ewil e, hertim baqî ye û tê de sûreta me’şûq (Xweda) dikare bê dîtin (‘Iraqî, 1362, 234-235). Li gorî Nesefî di deryayê muhîtê de (ku meqamê zat û sîfetên bêdawî yên Heq e û hemû hebûn mîna pêlên wê deryayê ne) Ayîneya Gîtînuma hatiye danîn da ku her tişt ku di wê deryayê de revan bibe, wêneya wî di Ayîneya Gîtînumayê de peyda bibe. Ev derya ‘alema xeyba xeybê ye û ev ayîne, dilê însanê kamil e (Nesefî, 1962, 237-238).

Di nêrîna Mela de jî bi zelalî tê dîtin ku dilê însanê kamil, neynika *Camê Cem* an Ayîneya Gîtînuma ye ku bi badeya le’lî ya ava heyatê ve hatiye tijekirin:

“*Dil ji ‘îlacê ku bi derket mizaç*
Dê ji lebe noş-i eta bit ‘îlac,
Ayîneyê Camê cehanbînê Cem
Badeyê le’lî me di cama zucac
Ji avê heyatê bi me da şerbetek
Zinde kirin ma ji ‘edû ra neşac
Bend-i kirim ger çi şubih filî bûm

Sîmiberê sa'id û bazû ji 'ac
Exterê îqbal û mehê bircê bext
Mihre spihrê kemer û text û tac
Kosê ku hingaftî bi şahî li text
Padişehan neqdê rewan dan xerac
Xwisroyê Şêrînê li derbendê husn/
Sîmberan lazim e lê mihr û bac
Sikkeyê şî'ra me bi navê te hat
Lew bi 'iyarê di cehan da rewac
Abê rewan min diye şî'ra Mela
Yunkiru li-lma'î li sû'i l-mizac" (Cizîrî, 2013, 38).

Dilê însanê kamil, ku Camê Cem e, hertim bi lutfê îlahî ve, ne bi meya engûrî/tirî (xweşîyên dinyewî) belku bi feyz û îhsana îlahî ve tije dibe da ku "hebûn" ji bo xwedîyê vî dilî her roj wekî 'îd/şahî û her şev wekî Leylet'ul-Qedrê be:

"Mislê Cem cama zêrîn xalî nebî te j' badeyê
Da ji xemra şadimanî dayima mexmûr-i bî
Hindekî roj û şev in têk 'îd û Leyl ul-qedri bin
Cam mudam pir bade bit lê ne j' meya engûrî bî" (Cizîrî, 2013, 147).

Dema ku dilê însanê kamil digihêje vê merheleyê, berîya her tiştî zatê bênişana Wî îdrak dike û di encama vê jî hemû wêneyên li ser Cam/neynikê muşahede dike û sirên her du 'alemê jî li ser xwe eyan dike. Di vê merheleyê de wekî Hafîzê Şîrazî dibêje, êdî hewce bi daxwazkirinê jî nîne û ev Came hertim bi lutfê îlahî tije dibe (Hafîzê Şîrazî, 1389, 26).

ENCAM

Mîtos bi piranî wekî organîzmeyeke fikrî ya zindî tê qebûlîkirin. Sehayê ku mîtos dikare zindîbûna xwe tê de bi-domîne jî cureyên cuda yên edebîyatê ne. Ji ber vê yekê pêwendîya mîtos û edebîyatê, pêwendîyeke bingeîn e, çimkî mîtos bi rêya edebîyatê hebûna xwe didomîne û edebîyat jî ji kesayet, sembol û hêmanên rîwayetên mîtik tê honandin. Ev pêwendî di pêvajoya tarîxê de dewam dike û digel guherînên ramanî di tarîxa mirovahîyê de hêj berdewam e.

Di edebîyata kurdî de jî hebûn û berdewamiya navborî û bikaranîna mîtosên kevn di metnên kurdî de bi awayekî zelal tê dîtin. Sembol, kesayet û hêmanên mîtik û rîwayetên wan, ku xwedî tarîxeke pir kevn in, ji serdema berîya îslamê derbasî serdema îslamî dibin û di qad û kontekstên cuda de, wekî destan, îrfan û helbesta modern, tên bikaranîn.

Di serdema îslamî û geşedana edebîyata kurdî ya klasîk de, yek ji sehayên bikaranîna mîtos û sembolên mîtik, edebîyata tesewîfî ye. Di edebîyata navborî de tê dîtin ku piraniya şairên mutesewîf ên kurd, di berhemên xwe de kesayet û hêmanên mîtik, di kontekstên cuda de û bi wateyên cuda bi kar tînin.

Melayê Cizîrî jî, wekî şa'îrekî mutesewîf an mutesewîfekî şa'îr, ji vê qaîdeyê mustesna nîne. Wî, di helbestên xwe yên îrfanî de gelek caran kesayet, hêman û sembolên mîtik bi kar anîne.

Bikaranîna kesayet/hêmanên mîtik di helbestên Mela de berîya her tiştî dikare wekî nîşaneyê berfirehiya zanîna wî bê qebûlîkirin. Yanî digel ku çavkanîya raman û hizra Mela, wekî mutesewîf/şa'îr Qur'an û zanistên îslamî ye, lêbelê zanist û agahîyên wî tenê bi van zanistan ne sînordar e. Şêwaza bikaranîna kesayet/hêmanên mîtik di helbesta Mela de, îsbata hakîmîyeta wî ye li ser çand, rîwayet û metnên berîya îslamî.

Xala din a girîng di bikaranîna kesayet/hêmanên mîtik di helbesta Mela de, meseleya guherîna wateyî ye. Di helbesta Mela de kesayet û hêmanên navborî jî wateya xwe ya mîtik yanî kesayetek lehengî an hêmaneke dersirûştî derdikevin û bi cezbe û îşraqa rûhanîya Mela, dibin xwedî cih û wateyeke manewî û îrfanî. Bi îrfana Mela, Çemşîd padişahê mîtik ku di rîwayetên kevn de sembola îhtîşama padişahîyê ye, dibe wekî salikeke sembola manewîyat û xwedî hêza batîni, îşraqî û sembola 'însanê kamil'. Bi heman awayî, di nêrîna Mela de Camê Çemşîd, objeya mîtik

a rîwayetên berîya îslamî, dibe xwedî wateyeke îrfanî û wekî sembola dilê însanê kamil, an ‘aşîqê rastîn an jî neyni-keke ku Me’şûq, heqîqet û sûretê xwe tê de eşkere dike. Dilê însane kamil ku cîhannuma ye, cîhan/’alemê ku bi xwe mehhûm û la-şey’û bêhebûn e, tê de bi tecellaya Xweda watedar dibe. Cih û mekana tecellayê ku hertim ji çîşîya deryaya rehmeta îlahî, ji meyê “elest” ku ava heyata rastîn e, tijî dibe.

ÇAVKANÎ

- ‘Iraqî, Fexredîn. *Kulliyatê Dîwanê Şêx Fexredîn ‘Iraqî*. amd. N. Hirî, Tehran: Întişaratê Gulşayî, 1362.
- Adak, Abdurrahman, Acar, Hayrullah, Aykaç, Yakup, “Bibliyografyaya Melayê Cizîrî”, *Mukaddime*, 2017, 8 (Özel Sayı 1), rr.171-199.
- Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Nûbihar, 2013.
- Alkış, Abdurrahim, *Melayê Cizîrî’nin Dîwanında Tasavvufî Mazmunlar*, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2016.
- Asana, Camasp (amd.), *Motûnê Pehlewî*. Tehran: Ketabxaneyê Millî yê Îran, 1371/1992.
- Avesta*, amd. C. Dustxah, ji farisî: Tahîr Agûr, İstanbul: Avesta, 2021.
- Aykaç, Yakup, “Şah û Pehlewânên Mitolojîk di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”. di nav, *Mîtos û Edebiyat, Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de*, ed. Shahab Valî & Kenan Subaşı, Nûbihar, İstanbul, 2022, rr. 205- 256.
- Azarkan, Muhammed Şerîf, “Molla Ahmed-I Cezerî Divanî’nin Nûshalarî”, *Elektronik Sosyal Bilimler Dergisi*, Cilt 22, Sayı 86, Nisan 2023, rr. 618- 629.
- Azarnouche, Samra, Redard, Céline, *Yama/Yima: Variations Indo-Iraniennes sur la Geste Mythique*. Paris: Publications de l’Institut de Civilisation Indienne. Série in 8°; 81, 2012.
- Bahar, Mehrdad, *Pejûheşî der Esatîrê Îran, Pareyê Nexust*. Tehran: Întişaratê Tûs, 1362/1983.
- Bartholomae, Christian, *Altiranisches Wörterbuch*. Strausburg: Vellag von Karl J. Trübner, 1904.
- Bexdadî, Ebdulqadir, *Luxetê Şahname*. amd. Carlos G. Saleman, wer. T.H.Sobhani & A. Ravaghi, Tehran: Anjoman-i Asar ve Mafakher Farhangi, 1382/2003.
- Borhan, Muhammed Huseyin bin Xelef Tebrîzî, *Borhanê Qatî*. cild 1, amadekar: M. Moin, Tehran: Ketabfiroşî-yî İbn Sîna, çap. 2, 1342/1963.
- Burûmend Se’îd, Cevad, *Hafîz ve Camê Cem*. Tehran: Pajeng, 1367/1988.
- Camus, Albert, *Le Mythe de Sisyphe, Essai sur l’Absurde*, Québec: Edition Numérique, 2010.
- Chardin, Philippe, “Thémarique Comparatiste”. di nav *Précis de Littérature Comparée*, P. Brunel, Y. Chevrel (ed.), Paris: Press Universitaire de France, 1989.
- Chase, Richard, “Myth as Literature”. di nav *Myth and Method-Modern Theories of Fiction*, ed. James E. Miller, University of Nebraska Press, 1960.
- Çalî, Şe’ban, *Şewazî Şî’rî Cizîrî*, Spirez Press, Duhok, 2008.
- Çelîktaş, Samî, “Hêmanên Mitolojîk û Kesayetên Efsanevî di Dîwana Melayê Cizîrî de”, di nav, *Cizîrînasî, Meqaleyên Libarey Melayê Cizîrî û Şî’rên Wî*, ed. M.Zahir Ertekin, Dara, İstanbul, 2021, rr. 263-289.
- Doru, Mehmet Nesim, *Melayê Cizîrî, Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*. İstanbul: Nûbihar, 2. baskı, 2016b.
- Doru, Mehmet Nesim, *Melayê Cizîrî, Hakikat ve Mecaz Arasında Bir Sûfî’nin Portresi*. İstanbul: Nûbihar, 2016a.
- Doskî, Tehsîn İbrahîm, “Melayê Cizîrî û Dîwana Wî”, di nav, *Cizîrînasî, Meqaleyên Libarey Melayê Cizîrî û Şî’rên Wî*, ed. M.Zahir Ertekin, Dara, İstanbul, 2021, rr. 25- 32.
- Einsentein, Samuel A., “Literature and Myth”. *College English*, Feb., 1968, Vol. 29, No. 5. rr. 369-373.
- Ekberrî, Ezîzmorad (amd.), *Şahnamey Kurdî, Behmen û Feramerz*. Stockholm: Neşrê Erzan, 2009.
- el-Dîmêşqî, Şemseddîn Ebî Ebdullah Muhammed bin Ebîtalîb el-Ensarî, *Nuxbet ‘ul-Dehr fî ‘Eca’ib el-Berr ve’l-Behr*. amadekar: M.A.F. Mehren, M.M. Eggers et Comp. et H. Schmitzdorff, Saint-Petersbourg, 1866.
- Emînî, Muhemed Reşîd (amd.), *Şahnamey Kurdî (Hewramî)*. Slêmanî: Melbendî Rewşenbîrî Hewraman, , 2010.
- Emînoğlu, Nevzat, “Estetîk û Cûreyên Wê di Şîrên Melayê Cizîrî de”, *Nûbihar Akademî*, Jimar 17, Sal 9, 2022, rr. 101-115.
- Ertekin, Nurettin, “Tesewuf di Dîwana Melayê Cizîrî da”, di nav, *Cizîrînasî, Meqaleyên Libarey Melayê Cizîrî û Şî’rên Wî*, ed. M.Zahir Ertekin, Dara, İstanbul, 2021, rr. 175-226.
- Falck, Colin, *Myth, Truth and Literature, Towards a True Post-Modernism*. Cambridge: Cambridge University Press, 1991.
- Firdewsî, Ebulqasim, *Şahname, Defter-i Sevvom*. Teshîh-i J. Khaleghi Motlagh. New York. Bibliotheca Persica. 1992.
- Firdewsî, Ebulqasim, *Şahname, Defter-i Yekom*. Teshîh-i J. Khaleghi Motlagh. New York: Bibliotheca Persica, 1997.
- Frye, Northrop, *Anatomy of Criticism*. Princeton University Press, 1973.
- Hafîzê Şîrazî, *Dîwan*. amd. C. Mensûr, Tehran: Neşrê Dîdar, 1389/2010.
- Hejar, *Dîwanî ‘Arîfî Rebbanî Şêx Ehmedî Cizîrî Meşhûr be Melay Cizîrî*, Sorûş, Tehran, 1361/1982.
- Hemzeyî, Ferîborz (amd.), *Rezmname, Ustûrehayê Kuhenê Zagros*. bexşê 2, cild 2, Kirmanşah: Întişaratê Danişgahê Razî, 1393/2014.
- Heras, H.S.J., “The Fall of Man in the Avesta”, di nav *M.P. Khareghat Memorial*. vol. I, A Symposium on Indo-Iranian & Allied Subjects, Bombay: The Shahnamah Press, 1953.

- Horkheimer, Max, Adorno, Theodor W., *Dialectic of Enlightenment, Philosophical Fragments*. Edited by Gunzelin Schmid Noerr, Translated by Edmund Jephcott, Stanford: Stanford University Press, 2002.
- Îrânşah bin Ebilxeyr, *Behmennâme*. amd. R. 'Efiî, Tehran: Întişaratê 'Îlmî ve Ferhengî, 1370/1991.
- Kakawend, Şahrux, *Zehak û Kaweyê Ahenger*. amd. E. Gecerî, Senendec: Întişaratê Meh, 1380/2001.
- Kavak, Abdulcebbar, "Melayê Cizîrî ve Tasavvufî Kürt Edebiyatının Gelişim Dönemi", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl, 1, Cilt 1, Sayı 2, Kasım 2015, rr. 48-66.
- Kendüleyî, Elmas Xan, *Sûgê Siyaweş*. amd. S. Fezlullah Dekeyî, S. Arman Dekeyî, Tehran: Neşrê Metn, 1369/1990.
- Kırkan, Ahmet, "Dîwanê Melayê Cizîrî de Mezmûnê Îranî û Dîwanî de Tesîrê Mewlanayî", di nav, *Cizîrînasî, Meqaleyên Libarey Melayê Cizîrî û Ş'irên Wî*, ed. M.Zahir Ertekin, Dara, İstanbul, 2021, rr. 293-335.
- Lutfîniya, Heyder (amd.), *Şanamey Kurdî, bergê yekem*. Seqiz: Dezgay Çapemenî û Belavkidenewey Bîryar, 1399/2020.
- Madan, D.M. (ed.), *The Complete Text of Pahlavi Dinkar, Part I, Books III-V*. Bombay: The Society For The Promotion Of Researches Into The Zoroastrian Religion, 1911.
- Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî, Şerha Dîwana Şêxê Cizîrî*. amadekar û wergera ji erebî: Emîn Narozi, cild. 1, İstanbul: Avesta, 2013.
- Melayê Cizîrî, *Dîwan*, (bi alfabeya erebî û latînî). amadekar: Emîn Narozi, cild. 3, İstanbul: Avesta, , 2013.
- Mawlana, Celaeddîn Muhammed, *Kulliyatê Şemsê Tebrîzî*. amd. B. Furûzanfer, Tehran: Întişaratê Emîr Kebîr, 1376/1997.
- Minavî Xîred. A. Tefezzolî (amd.), Tehran: Întişaratê Bonyadê Ferhengê Îran, 1354/1975.
- Monneyron, Frédéric, Joel, Thomas, *Mythe et Littérature*. Paris: PUF, 2012.
- Nesefî, Ezîzeddîn, *Kitab el-Însan el-Kamil*, amd. Marijan Molé, Tehran-Paris: L'Institut Franco-Iranien, 1962.
- Newwabî, M., Camasb Asa, K, *Gencîneyê Destnivîşayê Pehlewî ve Pejûhişayê Îranî*. Destnivîs C 4, Şîraz: Muessiseyê Asiyayiyê Danişgahê Şîraz, 1355/1976.
- Nizamî, *Îskendername*. amd. E.Ayetî, Tehran: Întişaratê 'Îlmî ve Ferhengî, 1373/1994.
- Nyberg, Henrik Samuel, *A Manual of Pahlavi II*. Wiesbaden: Otto Harrassowitz, 1974.
- Polat, Leyla, "Dualîzma "Aqil" û "İşq"ê di Dîwana Melayê Cizîrî da", *Kurdiyat*, 2020, Hejmar 2, rr. 23-37.
- Qur'ana Pîroz, Werger: M. Huseyn Êsî, M. Se'îd Girdarî, M. Muhammed Bêrkevanî, İstanbul: Ravza Yayıncılık, 2008.
- Restgar Fesayî, Mensûr, "Peykergerdaniyê Mowjûdatê Esatîrî der Şahname". di nav *Ferdowsî ve Huvîyet Şenasi Iranî, Mejmû'eh Meqalat derbareyê Şahname Ferdowsî* de, Tehran: Terhê No, 1381/2002.
- Restgar Fesayî, Mensûr, *Ferhengê Namhayê Şahname*. cild. 1, Tehran: Moessesseh Motale'at ve Tehqîqatê Ferhengî, çapa 1emîn, 1383/2004.
- Ricoeur, Paul, *Temps et Récit*. tome 1, Paris: Editions du Seuil, 1983.
- Segal, Robert A., "Myth as primitive philosophy". di nav *Thinking Through Myths, Philosophical Perspectives*. Edited by K. Schilbrack, Routledge, 2004a.
- Segal, Robert A., *Myth: A Very Short Introduction*. Oxford-New York: Oxford University Press, 2004b.
- Sezer, Müslîh, "Dîwana Melayê Cizîrî Wek Berhemeke Kanonîk", di nav, *Cizîrînasî, Meqaleyên Libarey Melayê Cizîrî û Ş'irên Wî*, ed. M.Zahir Ertekin, Dara, İstanbul, 2021, rr. 3-23.
- Sohravardî, Shaykh al-İshrâq Shihâboddîn Yahyâ, *L'Archange Empourpré, Quinze traités et récits mystiques*. traduits du persan et de l'arabe par Henry Corbin, Paris: Fayard, 1976.
- Suhrewerdî, Şehabeddîn Yehya, *Mecmu'e Musennîfatê Şêxê İşraq*, c. 3, amd. S.H. Nesr, Tehran: Muessiseyê Mutalî'at û Tehqîqatê Ferhengî, 1372/1993.
- Şîrwanî, Zeynelabidîn, *Riyaz ul-Seyahe*. amd. A. Hamid, Tehran: Kitabfiroşî Se'dî, 1339/1960.
- Tek, Ayhan, "Li Dor Nerî û Kanonê Wesfên Dildarê di Xezelên Melayê Cizîrî de", di nav, *Melanasî, Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî*, ed. A.Timurtaş, Y. Aykaç, H.O. Ahmad, Peywend, Wan, 2023, rr. 89-104.
- Tek, Ayhan, *Melayê Cizîrî, Jiyan û Tesîra Edebî, Şerha Xezelên Bijartî*. İstanbul: Nûbihar, 2019.
- Tenik, Ali, "Şeyh Ahmed Cizîrî'nin Şiirlerinde Varlık İlâhi Sevgi ve Cemal Konularının Tasavvufî Analizi", *Mukaddime*, 2017, 8 (Özel Sayı 1), rr. 93-118.
- Tolkien, J.R.R., *Beowulf: The Monsters and The Critics*. Sir Israel Gollancz Lecture, 1936.
- Uşîderî, Cihangîr, *Daneşname Mezdisna*, Tehran: Neşrê Merkez, çapa 3mîn, 1383/2004.
- Vali, Shahab (2023). "Nêrînek berawerdî li ser Şahnameya Firdewsî û Şahnameyên Kurdî: Mîna Camê Cem", di *Dilbilimi ve Karşılaştırmalı Edebiyat, Dilbilimi* de, ed. A. Kırkan & Y. Cengiz, Cilt ed. M. Yonat & A. Jankır, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları. rr. 129-153.
- Vali, Shahab, "Mîtos, Mîtoloji û Edebiyat". di nav, *Mîtos û Edebiyat, Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de*. ed. Shahab Vali & Kenan

Subaşı, İstanbul: Nûbihar, 2022, rr. 11-47.

Vali, Shahab, Ölmez, Cumhur, “Kesayet û Heyberên Mîtolojîk di Edebiyata Goranî/Hewramî de”. *Mitos û Edebiyat, Bikaranîna Mitosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de* içinde. ed. Shahab Vali & Kenan Subaşı, Nûbihar, İstanbul, 2022, rr. 291-361.

Yaheqqî, Muhammed Cafer, *Ferhengê Esatîr ve Dastanwareha der Edebiyatê Farisî*, Întişaratê Ferhengê Mu’asir, Tehran, 1386.

EXTENDED ABSTRACT

Just as there is a close relationship between literature and mythology, there is also a close relationship between mythical elements and their use in literary texts. Thus, mythical elements have been used in many meanings and representations in the texts of world literature and Kurdish literature, especially the classical ones, and have given a strong power and ability to the art of the text. Some of them remain literary representations rather than elements, and some carry deeper meanings than their literary shirts and become thought-wisdom-mysticism.

Jamshid as a mythical king and his Cup (Jâm-i Jam) as a tool of the future/world, are included in this representation and occupy a wide place in Kurdish-Iranian literature and various literary works. Jamshid, one of the most famous mythical kings, has been used as an archetype of possibility, power and authority. From the Avesta to Dinkerd, Bundehsh and Firdawsi's Shahnameh, from the texts of the history of Islam such as Akhbar'ul-Tawal of Dinaweri, Tafsir of Tabari, Zeyn'ul-Akhbar of Gerdizi to the Kurdish Shahnamehs, this name has been frequently mentioned.

Jâm-i Jam is the best known sign of Jamshid's personality in those products whose name is now associated with his Cup (Jâm). Camê Cem has an important place and various meanings and with names such as "Cup of Orrery", "Stereoscope Cup", etc. and it is mentioned in Islamic wisdom. The secrets of the world are discovered with the glass of the world, and it is also a symbol and sign of all the secrets in the human heart.

One of the most important poets, Mullah Jezeri, whose poems are considered a highlight of Kurdish literature, has depicted mythological characters and epochs in his poems. In addition to Persian poets such as Senayi, Attar, Rumi and Hafîz, Kurdish poets such as Ahmad Khani, Nali and many others, Mullah Jezeri also mentioned Jamshid and his Cup (Jâm-i Jam) in various meanings and depictions. The divan of Mullah Jezeri, one of the scholars of Kurdish literature, is one of the richest products in the field of literary-mythical and authentic elements, and Jamshid and Jam-i Jam have taken their place in this work. Mullah Jezeri has used and talked about this figure and the above-mentioned elements in a mystical, profound hermeneutic.

In this article, we will turn to the poems of Mullah Jezeri and look at how he used these two elements in a literary-mythical context. Before that, we will focus both on the history of Jamshid and Jâm-i Jam, as well as on their place in the view of mysticism, and clarify the sides of these two representations.

In this article, we will turn to the poems of Mullah Jezeri and examine how he uses these two elements in a literary-mythical context. Before that, we will focus on both the history of Jamshid and his Cup and their place in the view of mysticism and clarify the sides of these two representations.